

## Ji çîroknivîsên kurd, Hesenê Metê...



Xelil Duhokî

**Hesenê Metê**, yek ji çîroknivîsên serketiye û di van bîst salên dawiyê de, bi germî hate qada edebiyata kurdî û gelek berhemên bihagiran, efrandine û pirtûkxana kurdî dewlemend kiriye.

*"Dema yekem kurteçîroka Hesenê Metê ketiye ber çavên min, hîngê yekser, baweriyêke mukum ji bo min çêbû ku ew, xwedî behreke bilind e. Lê dema pirtûka wî (Smîrnoff) ronahî dît û gihîştîye min, piştî xwendina çîrokan, ez gihîştîm baweriyekê ku, berhemên wî hêjayî hindê ne ku mirov li ser binivîse."* (1)

Di vê dawiyê de, wî çend roman jî nivîsîne û her zû cihê xwe li cem xwendevanan peyda kir. Gelk kesan li ser berhemên wî nivîsiye, ji ber hindê jî, eger ez rê bidime wan ku, bîr û boçûnên xwe li ser çîrokên wî bêjin, wê baştir bibe. Lê dîsan ez dikarim bêjim ku, "zimanê wî, sivik û xweş e, niqteşanî bi ciwanî bikar anîne, hevokên xwe rêk û pêk darêjtîne, hewil daye bi kurmanciyêke paqij û petî binivîse. Ew hinde caran bi teknîka kevin ve girêdaye û rengê vegêranê bi kar aniye, lê piraniya çîrokên wî, bi teknîka modêrin, monolog û dialog, paş û pêşxistina demî û zincîra rûdanan, heta dawiyê bi hev re girêdayî ye. Her wisa pir zîrekane kariye qaremanên xwe bide peyivîn, ne ku gundiyeke bi zimanê mamostayekî û ne jî, jineke zana wek yeka nexwendevan. Ew bi zanabûn giriftariyan pêşçav dike û tê de serketî bûye, çinku **Çexov** dibêje: *"Ne fere li ser nivîserî ku, giriftariya çareser bike, belku; erkê wî yê bingehîn ew e ku, wan berçav bike."* (2)

Di sala 1957-ê de, li gundekî Erxenyê, ji diya xwe bûye. Zaroktiya wî li gund buhuriye, dû re ew bi qasî deh salan li hêla Mersînê maye. Ji ber xebatên xwe yê siyasî, çend caran hatiye girtin. Di 1980-î de, gehiştê rêzên şoreşa kurdî û piştî sê salan, xwe gehande welatê

Swêdê.

**A. Meretowar**, di nivîseke xwe de, dibêje: "Kurteçîrokên wî xweş; xwerû û xwedî zimanekî rewan û dewlemend e. Wî ew berhemên xwe bi nîgarên giyanî rewişandiye. Em dikarin kurteçîrokên wî yên ku di Epîlogê de, hatine hemberî me, ji aliyê mijarî ve bi vî rengî dabeşî bikîn:

a) Kurteçîrokên ser rewşa giyanî ya cîvakê û rastiya tehl a malbatî.


b) Rewşa kesaniya mirovên c i v a k a m e .

c) Têkiliyên xembarane yên mirovên me ku bi çi teherî ne li hember gel û welêt. d) Rewşa derûnî ya penaberiya welatîyên Mezopotmayayê. Mijar têra xwe balkêş in. Bi rêya rêbaza rasteqîniyê rewşa giyanî ya mirovên me, dibe ku rewşa

derûniya me bi xwe, rewşa derûniya şexsê xwe bi xwe, bi zimanê xwe nîgar dike. Divê em li vê derê, navêkî daynin li vê serdema ku nivîskarê me tê de, ev berhem daye. "Serdema Vejîna Wêjeya Kurmanciyê". Ev serdem hem li derveyê welêt, hem jî li nava welêt geş bûye. Di pey van dîtinan de, em dê bêguman serketîbûna wî, bi dengê bilind eşkere bikin. Bela ku rastiyeke resen a gelê me û neyarê me aniye ber çavê me, bi zimanekî henûnî. Bela ku nexweşîneke me yî giran ku bêhm çikandiye li me, zû teşhîs kiriye, bala tixtorên me yên jiyana cîvakî kişandiye serê da zû tedawî bikin. Zimanê berhemê sivik e, rewan e, xweş e, bi tam e. Tama Kurdiyê, di dereceya herî bilind a huneriyane de, ji hevokan tê. Zimanê dayikê gihandiye zimanê herêmi. Kurdiya xwe ya herêmi jî bi kurdiya gelî ve şa kiriye." (3)

**Dilawer Zeraq**, li ser romana wî ya bi navê "Labîrenta Cinan" bi vî rengî dinivîse:

"Em wekî gotina dawî dikarin vê bibêjin ku romana Labîrenta Cinan rexneyek li ser rewşenbîriyê ye ku di kesayetiya mamoste Kevanot de, hatiye dawer û simbolîzekirin. Ev rewşenbîrek e ku dike nake nikare (ji ber sedemên ku wî bi xwe mêjî û kesayetiya xwe danehûrandiye û zelal nekiriye, tesîr û bandor li ser civakekê biçûk jî bike û wê veguherîne û bi vê têkçûyîne



H  
e  
s  
e  
n  
ê  
  
M  
e  
t  
ê

re jî pêvajoya biyanîbûna ji xwe re, bi awayekî tirsnak û diwartirîn dijî û di dawiyê de jî (ji ber ku rêwitiya ku wî bi xwe daye destpêkirin û bêhemdî wî bi dawî bûye) êdî dike nake nikare 'xwe' yî berê jî bibîne. Û piştî her carên ku min romana Labîrenta Cinan wekî ku ez ji bo şikandina tîna xwe piyal ser piyal avê vexwim, xwend, ez çûm ber neynikê rawestiyam û di nav çavên xwe de, li psîkolojî û barûdoxa ku ketime geriyam. Di her sê caran de jî çavên min dîn bûbûn û bi awirên xwe yî erjeng ji min re digotin; " Wey Xwedê!... Dema ku em di nivîsekê de

xwe wekî lehengê dihesibînin û nivîskarî/ê di cihê afirîner û dahênanê/a jiyana xwe ya hundirîn de dibînin, aha wê demê em bi nivîsarê ve derdikevin rêwitiyeke ku me bi hemd û zanebûna xwe ew bijartiyê û pejirandiye." (4)

**Memo Kamo**, di hevpeyvînekê de, vê pirsê jê dike: "Ez wek xwendevanekî supasiya te dikim ku te çend berhemên nivîskarên rûs wergerandine kurdî. Hinek dibêjin ne pêwîst e ku wergerên ji jimanên din hebin, pêwîst e berê em zimanê xwe baş bizanin û dû re dest bi wergerê bikin. Tu çi dibêjî?"

Ew jî bi vî rengî bersiva wî dide û dibêje: "Bêguman. divê meriv zimanê xwe jî û zimanê din jî bizanin, ji xwe ev nebe werger jî nabe. Başî û xirabiya wergerekê jî, ji wergêr û ji zanebûna wî û wan zimanan dihê. Di warê her du zimanan de, di warê zanebûna lîteratur û nasîna nivîskarekî de divê şarezaiya wergêr bi xwe hebe. Ku ev tune be ji xwe karê wergerê jî nabe, û bibe jî ne wergereke serketî jê dernakeve. Lê tiştêkî din heye, ji bo pêşxistina edebiyat û zimanekî, karê wergerê gava yekemîn û girîngtirîn gav e. Vê yekê meriv di karê şexsî de zelaltir dibîne. Weke nimûne: Yek dikane romaneke sedrûpelî bi du hezar peyvîkên cuda cuda binivîsîne, lê ji bo wergereke sedrûpelî ez bawer im pêwîstiya wî ji hejmareke zêdetir dibe. Ji bilî viya meriv li peyvîkan digere, meriv lê dikole ka kîjan form û babetên hevoksaziyê li zimanê malê tê. Ev hemû tişt alîkariya yekî û zimanê wî dike." (5)

**Laleş Qaso**, di hevpeyvînekê de, vê pirsê jê dike: "Birêz Hesenê Metê, te heta niha şeş kitêb nivîsandine, ji van kitêban sê heb jê werger û sê heb jî ên te bi xwe ne. Belê min dît ku di hemûyan de, tu hîn jî li gor rêbaz û destûrên C. Bedirxan çûyî".

Ew jî bi vî rengî bersiva wî dide û dibêje: "Bibuhure, lê tu zimanekî

wusa bi kar tînî... mîna ku herkes derketine jor û ez li jêr mame. Ez ne serhişk im, ew cesareta li ba min tuneye ku di vê rewşa îro de berê her yekî ji me li derekê ye, ez rabim gramera binivîsînîm, di zimên de reforman bikim û êşa serî girantir bikim. Reformên ku di zimanan de dibin her tim pêşketinekê didine ber xwe. Ez bi xwe jî bi vê yekê re me. Lê mixabin guhertinên ku bi navê reforman hatine kirin, tiştên ku hebûn jî deforme kirine. Sedema ku ez li gor gramera C. Bedirxan çûme û hîn jî diçim, hemû jî ji bo silametiya zimanê me ye. Min ne xwest ez beşdarî vê aloziyê bibim. Te got erêş Divê em ji bîr nekin, heta van çend salên dawîn jî di kovaran de û bi taybetî jî di Berbangê de her redaksiyoneke nû daxuyaniyek dinivîsand ku ew ê kovarê li gor kîjan gramere binivîsînî. Baş nayê bîra min ka bê weke daxuyanî hate nivîsandin an ne, lê di hinek redaksiyonan de dihate gotin ku ji sedî heştê gramera Mîr Celadet, ji sedî deh gramera Q. Kurdo, ji sedî pênc gramera Apê Osman û Xwedê dizane serê sedê mayî jî bi xwe li hev dihanîn û tiştêkî ecêb jê derdixistin. Bi kurtî tiştê ku bû û pêk hat ev gramera îroyîn e û pê tê nivîsandin. Baştir bû ku em li gor destûr û rêbazên gramerekê bimeşiyana û bi taybetî jî gramera Celadet Bedirxan. Ji ber ku gelek hejmarên kovar, rojname û tiştên din bi elfabe û gramera wî derketin. Heta wê roja ku otorîta ilmê ziman, dezgehên xwediyê vê fonksiyonê çêbûbana, diviya bû me destdirêjiya reformên ziman nekira." (6)


**Lokman Polat**, di hevpeyvînekê de, vê pirsê jê dîke: "Li ser nivîskarên ku bi eslê xwe kurd û bi kurdî nanivîsînî, tu çi dibêjî? Gelo meriv dikare berhemên wan weke edebiyata kurdî bihesibîne?"

**Ew** jî bi vî rengî bersiva wî dide û dibêje: "Ev pirsê ha jî bû pirsê nîzanim çawa. Di hinek warên huner de îdentîfikasiyona huner û hunermend yek e. Di hinek warên huner de jî du îdentîtet hene. Yek îdentîteta hunermend û ya din jî ya huner. Edebiyat ji vê yekê nimûneyek e. Ew nivîskarên ku bi îdentîteta xwe kurd in, ji xwe ew kurd in û nikanin bibin xwediyê îdentîteteke din. Lê berhemên wan bi kîjan zimanî hatibin nivîsîn, ew berhema dibe edebiyata wî zimanî û hew. Li vir divê mijar, motîf û fîguranên berheman serê me tevlîhev neke. Ez hertim nimûneyeke weha didim û dibêjim: Li ser dema Hitler romanek hatiye nivîsîn. Bûyer li fransayê derbas dibe. Mijar li ser keçeke polonî û leşgerekî îtalî ye. Kurdekî ku ji dewra Zerdestî de li Hindîstanê ye û bi kurdî nizane, rabûye ev romana xwe bi zimanê urdu nivîsiye. Pirs: ev roman romana edebiyata kîjan zimanî ye? Nimûneyeke ekstrem, nimûneyeke çêkirî ye, lê divê hinek tişt jî îzêhetên xwe hebin. Mijar, fîgur, cî, wext, motîf û nivîskarê berhemekê jî nikane berhema zimanekî bike edebiyata zimanekî din. Ev nayê wê maneyê ku meriv îdentîteta nivîskarekî ji dest digirin, wî piçûk dibînin an jî tiştêkî din." (7)

**Serkan Brusk**, di hevpeyvînekê de, vê pirsê jê dîke: "Li gor te pîvanên çîrokek xweş çi ne? Wek tu dibêjî noveleke xweş çawa tê nivîsandinê?"

50 **Ew** jî bi vî rengî bersiva wî dide û dibêje: "Xweşiya novelekê tiştêkî îzafî

ye. Xweşî, li gor pîvanên ruhiyeta xwendevanekî ye û pirî caran ji bo motîva novelê tê gotinê. Ji bo oldarekî motîva Xwedê û pêxemberan xweş e, ji bo yekî koçer motîva zozan û reşmalên şevên havînan xweş e. Lê ji motîvekê bêtir di novelê de motîvasyon çiyekî xwe î xas heye ku em îro jê re dibêjin noveleke serketî. Ez naxwazim li vir receptekê (recete) bidim yekî ku ew ê çawa novelekê bihûne. Bi recept û şîreteke weha meriv kopiya niviskariyekê hînî hinekan dikin û ne tiştêkî din. Lê çend tiştên girîng hene ku niviskar û nemaze niviskarên novelan divê xwe jê dûr bixin. Motîvo çî dibe bila bibe, lê di nivisandina xwe de divê niviskar çikos be, sembol, figur û tiştên zêde nekurisîne novela xwe, di nivisandina xwe de ne dost û ne jî dijminê



lehengên xwe be, ji komantar û biryaran dûrkeve, ji pênuşa xwe nav û rengan li lehengên xwe neke. Girîngtirîn tişt jî ew e ku niviskar hertim valayîyan di nivisa xwe de bihêle, xwendevan raserî dudiliyekê bike ku piştî xwendinê ew bi xwe têkeve lêgerînekê. Ev lêgerîn ruhê xwendevan dewlemendtir û ramanên wî feretir dike." (8)

**Özgür Basut**, di hevpeyvînekê de, vê pirsê jê dike: "Pirsek heye ku li serê pir devjengî tê kirin. Hin kes dibêjin ku huner ji bo hunerê ye û hin kes jî dijberî vê fikrê ne û dibêjin, huner bo gel e. Derheqa vê mijarê tu çî difikirî, dîtînen te çî ne?"

Ew jî bi vî rengî bersiva wî dide û dibêje: "Wellehî ez nizanim, ev tiştêkî klasîk e dîtina herkesî cuda ye, lê ez bi xwe ji felsefeyê weha dûr im. Ez nikanim xwe bidim aliyekê vê felsefê û bibêjim huner ji xelkê an jî ji bo huner e. Dema motîva novelekê bi min ve xuya dibe, ez nabêjim ev ji bo xelkê ye... ew ê ji bo xelkê xizmetekê bike. Naxwazim ku ez di novelekê de şîretan li hinekan bikim. Min dil nîne ku ez yekî ji rê derxim an jî yekî bidim ser rêyêke rast. Lê ku giraniya estetîka hunerî hebe û berhem bi her awayî kamil were afirandin (kîjan huner dibe bila bibe), yek bixwîne û bi kîjan awayî dibe bila bibe jê îstifade bike, daxwaz ev e. Li ba min niviskarek ne mecbûr e ku tenê problemên xelkê binivisîne. Ez bawer nakim, novel û roman ê problemên xelkê çareser bikin û wan xelas bike." (9)

**Dilbixwîn Dara**, di hevpeyvînekê de, vê pirsê jê dike: "Ez meraq dikim, hema hema di hemû çîrokên te de mirov li sehneyên trajî-komîk rast tê,


ev ji hunera çîrokê tê, yan jî tu civaka kurd wiha dibînî?"

**Ew** jî bi vî rengî bersiva wî dide û dibêje: "Jiyan bi xwe sehneyeke welê ye: Trajî-komîk. Lê ez welê bawer dikim ku ew erd û ew civaka ku em kurd jê ne, çu carî ji evê sehneyê daneketiye û her li ser vê sehneyê bûye. Mîna perdeyên tiyatroyên yewnaniya antîk dawîya her tiştê me hertim bi trajediyekê xelas dibe. Lê wek ku dibêjin dema ku ev trajedî jî her dubare bibe, êdî rengê komîkiyê jî di xwe de diguncîne." (10)

**S a m î E r g o ş î**, di hevpeyvînekê de, vê pirsê jê dike: "Di roman û çîrokên xwe de tu hertim rewşa civateka têrproblem û ber bi xerabûnê ve radixî ber çavên xwendevanan. Gelo halê civata me gelekê xerab e yan jî sebebêkê dî heye?"

**Ew** jî bi vî rengî bersiva wî dide û dibêje: "Du tiştên, bi gotina te têrproblem hene: Yek jiyan bi xwe êş û problemeke mezin e, ez welê dibînim ya didoyê jî rewşa me kurdan e. Rewşa me ji mêj ve bûye sahneyeka trajîk, hertim welê bûye. Bi gotineka din, ez welê bawer dikim ko ew erd û ew civaka ko em kurd jê ne, ti carî ji evê sehneyê daneketiye. Mîna wan perdeyên tiyatroyên yewnaniya antîk wek ko min got, dawîya her perdeyeka me jî hertim bi trajediyekê xelas bûye. Ev perdeyên trajediyê jî dema her dubare bibe, wek ko dibêjin, êdî rengê komediyê jî di xwe de diguncîne. Trajî-komîk. Belkî jî ev yekem sedem e ko di novelên min de rewş bi rengêkê welê dixuye. Û sedema didoyê jî Xwedê dizane ew e ko di nivîsandinê de ne figurên îdealîzekerî û ne jî uslûbên pesindanê evana bala min nakişînin." (11)

**Receb Dildar**, di nivîseka xwe de, weha dibêje: "Zimanê novela (*Gotinên Gunehkar*) gelek sivik û herikbar e. Ew jî hostatiyeke Hesenê Metê ye. Bi rastî, gava min ev novel xwend tahma «Sîmyager» a Paulo Coelho jê girt. Ma ji xwe çend nivîskarên me hene ku bi kurmanciyê ewqas paqij dinivîsînin? Hesenê Metê di zimanê kurmançî de deqekê giran e. Divê meriv heqê wî bide." (12)



**Pirtûkên wî heta niha çap kirî, ev in:**

1. Keça kapîtan. Aleksandr Pusjkin, werger ji rûsî. Weşanxana welat, 1988.
2. Mirina karmend. Anton Tjechov, werger ji rûsî. Weşanxana welat, 1989.
3. Merivên reben. Fjodor Dostojevski, werger ji rûsî. Weşanxana welat, 1991.
4. Jiyana rastîn. Göran Tunström, werger ji swêdî. Weşanxana Apec, 2003,
5. Ansîklopediya Zarokan, werger ji swêdî. Weşanxana Apec, 2004.
6. Ardû, kurteçîrok. Weşanxana welat, 1990.
7. Smîrnoff, kurteçîrok. Weşanxana welat, 1991
8. Labîrenta cinan, kurteçîrok. Weşanxana welat 1994.
9. Epîlog, kurteçîrok. Weşanxana Nûdem, 1998.
10. Tofan, kurteçîrok. Weşanxana Apek, 2000
11. Gername, Weşanxana Apek, 2005.
12. Anri Oku dedi yaz demedi. Bi tirkî. Weşanxana Avesta, Istanbul, 2003.
13. Ecinni Labirenti. Bi tirkî. Istanbul, 2005.
14. Gotinên Gunehkar. Roman. Weşanxana Avesta, Istanbul, 2007.

**Çavkanî:**

1. Xelîl Duhokî. Kovara "Nûdem", hejmar 10, sala 1994. Swêd.
2. Her ew çavkanî.
3. A. Meretowar. Rojnama "Mehname" ya Internêtetê, hejmar 43.
4. Dilawer Zeraq. Ji internetê hatiye wergirtin.
5. Memo Kamo. "Hevgirtin", hejmar 22.
6. Laleş Qaso. Kovara "Çira", hejmar 11. Swêd.
7. Lokman Polat. Kovara "Helwest" hejmar 8.
8. Serkan Brusk. Rojnama "Azadiya welat", hejmar 153, 1999.
9. Özgür Basut. Kovara "Roja Teze", hejmar 6-7 1999.
10. Dilbixwîn Dara. Rojnama Internêtetê, Avesta 9.
11. Samî Ergoşî. K.TV, Kurdistanê başûr.
12. Receb Dildar. [Www.netkurd.com](http://www.netkurd.com)